**PEYMANA HIKIMDARAN 1535 Peymana Qanûnî Siltan Silêman Digel Hakimên Kurd***

Asst. Prof. Mehmet Rêzan Ekinci
Beşa Dîrokê- Zanîngeha Mêrdînê- Mardin/ Turkey

**Kurte:**

Sedsala 16an Xet û Rêya Hevrîşimê ku Kurdistanê re derbas dibû guherî, êdî giranî ket ser rêya kişandinên malên bazirganî li ser rê ya deryayan. Li ser vê jî Kurdistan rewş û hêza xwe ya aborî ya berê winda kir. Wê hingê rêveberîya Kurdan ne yekbûyî bû û ji ber vê jî Kurd bi rewşeke nebaş a aborîyê re rû bi rû man. Ji ber ku mîr û hikimdarên Kurdan hev nedigirt, Şah Îsmaîl ew axa parçe parçeyî ya Kurdistanê girt bin desthilatdarîya xwe. Di vê pêvajoyê de hin mîran serxwebûna xwe winda kir û erdê wan ket bi destê Şah Îsmaîl. Ji ber vê tevî Hakimê Heskîfê Melik Xelîlê kurê Melîk Silêmanê Eyyubî, Hakimê Cizîrê Şah Elî Begê kurê Mîr Bedir Boxtî, Hakimê Şêrwanê Şah Muhammed, Hakimê Bradostê Gazî Qiran kurê Siltan Ehmed Beg, Hakimê Hîzanê Mîr Dawidê Hîzanî, Şah Elî Begê kurê Mîr Ebu Bekir, 12 hikimdarên Kurd ji bo muzakereyê li hev kir û çûn Xoy û Tebrîzê cem Şah Îsmaîl. Lê berevajî lihevkirinê, wî mîrek avêtin girtîgehê, dijminahî bi wan re kir û Diyarbekir, herêma mîrektîyên ku giredayî wê Egil, Mûsil, Sincar/Şengal, Mêrdîn, Erzîncan, Xarpêt, Ercîş dagir kir. Di wê pêvajoyê de êdî Kurdistan bi serdema berzebûna du hêzên mezin re di navbera Dewleta Osmanî û Safewîyan de rûberû ma û bû qada şer. Hikimdar û Mîrên Kurdistanê neçar man û wan berê xwe da Osmanîyan ku erdê xwe ji destê Sefewîyan bifilitînin. Nêzî sî pêşewayên Kurdistanê wek nûner İdrîsê Bedlîsî û Mihemed Axayê Kelhokî şandin Stenbolê bo sazkirina yekîtîya xwe digel Osmaniyan. Selîmê I. ev pêşniyaz bi erênî pêşwazî kir û heta pejirand ku fermanrewaya wan a mayînde ya ji bav bi kur li ser axa xwe wek “mafê irsî” berdewam bikin. Piştî vê lihevkirinê Osmaniyan li hemberî pirsgirêkên li ser sînorê Îranê, bi sedan sal Kurd wekî “seddê sedîd/tampon” bi kar anîn. Lê rewşa aram a li ser sînorê Osmanî û Îranê piştî demekê bi şûn de xerabtir bû. Qanûnî di sefera Iraqeyn de pêdivî bi mîr û hakimên Kurdistane dît. Qanûnî ji bo sefera Îranê piştgirî ji wan xwest. Wan jî ji siltan xwest ku mafên mîrata welatê wan bide wan. Li ser vê Siltan Silêman “Peymana Hikimdaran” ku bavê wî Siltan Selîm di sala 1514an de bi mîr û hakimên Kurdistanê re çêkiribû di sala 1535an de dubare kir. Qanûnî Siltan Suleyman ev *mafê irsî* bi peymannameyekê digel hikimdarên Kurdistanê tekuz kir. Ev xebat li ser vê peymanname/muahedenameyê û naveroka wê rave dike. Li gel vê, ev xebat bicihanîn û bicihneanîna vê peymanê li gor çavkanîyên serdemî ve vedikole.

**Bêjeyên Sereke:** *Peymana Hikimdaran, Mu’ahede ya Hûmayûn, Kurdistan, Mîrektiyên Kurd, Mafên Îrsî*

**Destpêk:**

Bi xemên îdeolojîk, carna beşên çep û carna jî beşên neteweperest hewl didin ku karakterên dîrokî li gorî ramanên xwe biguncînin. Li gorî wan şert û mercên serdema

dîrokî û sedemên kiryarên aktoran ne pir girîng e. Xema hevpar a van koman ew e ku çima şert û mercên aktoran li gorî daxwazên wan nabin. Bi vî awayî, ew dikarin aktor û bûyerên dîrokî li gorî daxwazên xwe bitewînin. Ji bilî lêkolîna rastiyan, ew bêyî ku zanibin ku ew anakronîzmê dikin, beşdarî çalakiyên dadweriyê dibin. Heqîqet ew e ku rastî nayên tewandin li gor daxwazan. Wê demê rastî ji holê radibe û mijar ji dîrokê derdikeve. Di vê çerçoveyê de rolên mîr û hakimên Kurdistanê ji holê radikin û ji Îdrîsê Bedlîsî re roleke awarte tê dayîn. Ji ber vê yekê Îdrîsê Bedlîsî li pêşiya dewletbûnê asteng tê dîtin û heta bi alegoriya Îdrîs an jî Îblîs xayîn tê ragihandin. Di vê gotarê de şert û mercên serdemê, aktor çima wisa û çawa tevdigeriyan, wan çi dixwest, ji van xwestekan wan karîbû çiqas pêk bînin û çima nekarîn pêk bînin, hat kurtkirin. Herweha du peymanên ku ji ber pêwîstiya Kurdan bi wan re hatine çêkirin, wê di şert û mercên serdemê de werin lêkolînkirin. Yek ji wan peymanan, a bav Siltan Selîm û ya din jî ya kurê Qanûnî Siltan Silêman e. Di her du peymanan de jî, hâkim û mîrên Kurdistanê wek terefekî mutefiq û aktor -ne obje- li bal Împaratoriya Osmanî cih girtine. Her çend ev peyman neyên behskirin an jî were înkarkirin jî, em gihîştin orîjînala peymana heyama Qanûnî. Me ev peymana ku di serdema Qanûniyan de bi navê Peymana Hikimdaran a sala 1535an hatibû çêkirin pêşkêşî kesên têkildar kir. Me hewl da ku em bi taybetmendiyên wan vebêjin ku ew ji hêla pêkhatî, form û naverokê ve çawa peyman/mu'ahede ye.

**Rewşa Kurdistanê di ss. 11.-16.**

Ji destpêka dîrokê vir de hêzên serdest li ser Cografya ya Kurdistanê, tekoşîn kirine. Her hêzek li ser axa Kurdistanê xwedî îdîa bûye. Vê rewşa ha nehiştiye xêzkirina sînora Kurdistaneka diyar çêbibe ku her alî pê razî bin. Ji bilî vê di qada siyasî de yekîtîya Reveberiyeka Kurdistanê jî çênebûye ku hemû Kurd li ser tifaq bikin. Ji van sedemên rêzkirî dikare bê gotin ku Kurdistanên ku di demen cuda û parçeyên cuda de çêbûne hatine dîtin. Ji hêla dîrokê ve wekî her netewe ku li ser navê neteweya xwe bi navê Kurdistanê ku bi tene ji Kurdan pêkhatî ava nebûye. Lê pir dewlet ji bo Kurdistanê bi dest bixin têkoşîn kirine û wan ew bi dest jî xistiye. Dewleta Kurdan ku li vî axê hatiye damizrandin, îro di tevahîya qad û erda Kurdistanê tê îdiakirin de bi navê Kurdistanê ava nekiriye. Bi vî awayî Dewletên Kurdan belku ne bi temamî, lê parçeyekî di vê qadê de ava bûye. Ji bilî van argumanan û hemû jî li aliyekî, Şeref Xan (2012:101-102) pêşenga dîroknivîsa Kurdî, Kurdistanê wek welatê Kurdan bi nav kirîye, sînorê ax û welatê Kurdistanê weha xêz kirîye: "Ji ser qeraxên Behra Hurmuzê ku dikeve ser Okyanusa Hindî, dest pê dike û ji wir xetek rast dikişe û tê heta digihîje herêma Meletî û Mereşê. Welatê Faris, Iraqa Ecem, Azerbaycan, Ermenistana Piçûk û Ermenistana Mezin dikevin milê bakurê vê xeta han. Iraqa Ereb, Mûsil û Diyarbekir jî dibin başûre vî sinorî.

Sedemên ku Kurdistanê asteng dikin hene. Sedemek ji hêla stratejîkî ve ew e ku, ev der li ser rêya Baharat û Herîrê ye (Akdağ 1995:358). Ev der bûye qada tekoşînê ya hêzên ku dixwestin xwedî li vê aborîya rêya bazirganîyê derkevin (Şemsi 2010:68). Di dîrokê de hêzên ku Kurdistan dagir kiriye ev in: Pers, Rom, Îskenderê Mezin* (Campanile 2009:51-52) Bîzans, Selçûqî, Aqqoyunî, Qereqoyunî, Mogol (Safrastian 2007:41-43), Tatar (Tîmur) û li paşî jî Faris û Osmanî (Aydeniz 2012:13-34).

Ji sedsalên 11an heta sedsala 16an avaniya siyasî ya Kurdistanê ji yek pêkhateyekê pêk nehat. Li gor Şeref Xan, li dora sedsala 11an Kurdan li Diyarbekir, Cizîr, Dînewer, Şarezor (Erdelan), Loristanê û paşê li Şam, Misir û eyaletên Farsê hikimetên

serbixwe ava kirin û ji bilî van 46 mîrgehên Kurd ên biçûk jî ava kirin. Di sedsala 12an de Selçûqiyan êrîşî Kurdistanê kir û ew dewlet û û mîrekiyên ku ji hêzên eşîrî yên perçebûyî pêk dihatin lawaz kirin. Di sedsala 12an de Selçûqiyan êrîşî Kurdistanê kir û piştî ku wan ew dewlet û mîrekiyên wê derê yên ku ji hêzên eşîrî yên perçebûyî pêk dihatin lawaz kirin, îca bi demê re ew ji holê rabûn. Di sedsala 13an de jî Kurdistan rastî êrîşên Xarezmşah, Atabegên Azerbaycanê û Mongolan hat (Şemsi 2010:70). Êrîşên Moxolan bû sedema wêrankirina piraniya Kurdistanê. Ji ber van bûyeran hin Eşîrên Kurdan neçar man koçî Cezayîr û Misrê bikin (Jwaideh 2009:42-43). Di dema Împeratoriya Eyûbiyan de Kurd li cografyaya ku heta Afrîkayê digihîşt, bi cih bûne, di bin bandora Moxolan de cih û warên xwe terikandine û tevlî Kurdên wir bûne. Ev jî yek ji sedemên hebûna gelê Kurd e ku îro li wan deran heye.

Piştî lawazbûna Moxolan vê carê li Kurdistanê du xanedanên Tirkmenan derketin holê. Ew jî Aqqoyun û Qereqoyuniyan in û her du jî dewletên xwedî avahiyeke konfederatîf in ku dem bi dem bi Kurdan re tifaq kirine. Ev têkiliyên îttîfaqê li ser bingeheke simbiyotîk pêk hatine. Ji ber vê yekê ev bingeh li ser xeta siyasî bû ku carinan erênî û carinan neyînî dimeşiya (Woods 1993; Aydeniz 2012:30, 57-58, 85, 92). Sefera Rojava ya Tîmûr jî di vê demê de pêk hat (Jwaideh 2009:42-43). Di sedsala 14an de, berî ku Tîmûr dest bi êrîşa xwe ya rojava ku Kurdistan jî di nav de bû bike, pêşî êrîş bir Hindistan û derdora wê (De Clavijo 1993:19). Tîmûr di sala 1394'an de ji Îzedîn Begê Mîrê Cizîrê piştgirî xwest bo êriş bike bi ser Ereban. Mîr vê daxwazê qebûl nekir û Tîmûr Cizîrê wêran kir (Şeref Xan 1998:104-106).

Tîmûr wilayeta Diyarbekirê wek "tiyul"* da Tur Alî Begê Aqqoyunî. Piştre Hesenê Dirêj di sala 1453an de serweriya Diyarekirê girt. Di dema xwe de wî mîrgehên Kurdistanê wêran kir (Ebubekr-i Tihranî 2001:103, 105, 114, 132, 147). Piştî Tîmûr li Kurdistanê têkoşîna Aqqoyunî û Qereqoyuniyan dest pê kir. Bi şêwe ya siyaseta Şîîtî ya Aqqoyunî û Sunnîtî ya Qereqoyunî, wan li Kurdistanê wêraniyeke mezin pêk anî. Mîrgehên Kurd tasfiye kirin û siyaseta tayînkirina serokên Tirkmenan şopandin. Mîrgehên Kurd û eşîretên wê di bin siyaseta cuda ya mezhebî ya her du hêzan de para xwe wek hilweşandinê girtin (Aydeniz 2012:43-49, 87).

Şah Îsmaîl di şerê sala 1501ê de Aqqoyunî têk bir û Tebrîz kir paytext. Bi vê bûyerê re Şah Îsmaîl ket ser text û bi vî awayî dewleta Sefewî ya Şîî ava bû. Li aliyê din Aqqoyunî kete pêvajoya hilweşandinê. Di heman demê de Mîrên li Kurdistanê bi têkbirina Aqqoyunîyan yek bi yek serxwebûn bi dest xist (Nuri C. & Nuri F. 2021:86; Aydeniz 2012:143-149).

Şah, di salên xwe yên destpêkê de bi desteserkirina bermayiyên Îranê û Memalika Aqqoyunîyan mijûl bû. Di heman demê de Mîr Saremê Mukrî li derdora gola Urmiyêyê serweriya xwe berfireh dikir. Li ser vê yekê, yekem hemberhevhatina Mirê kurd û Şah Îsmaîl bi vê bûyerê re çêbû. Gelek êrîşên Qizilbaşan ên li ser Saremê hatibûn şandin lê wî ew têk birin. Lê li dawiyê ew têk çû (Ferruhi û Eminpur, 2021:125-128). Ferruhi û Eminpur (125-128), dibêjin ku di mînaka bi têkçûna Sarêm de, siyaseta serxwebûnê ya mîrên Kurd têk çû. Lê piştî Mîr Sarem, dema Şah Îsmaîl hewl dide serdestiya xwe bi pêş bixe, hinek ji mîrên Kurd berxwedana xwe domand. Lê belê, weke ku di bûyerên jêrê de jî tê dîtin, ew berxwedaneke pûç bû ajotin mina ku yek bi yek li bendê bûn, wan winda kir. Mîrên Kurd li dijberî leşkerên ku hatin ber deriyên wan, nekarîn eniya berxwedanê ya

yekbûyî saz bikin. Di rastiyê de, heta niha daneyeke ku hewildaneke wan a wisa nîşan bide jî tune ye.

Mîrgeha Dunbulî ji xwe ji dema Şêx Heyderî ve dilsozê Sefewiyan bû (Başçı 2019:63-114, s. 73-74). Hakimê Hesenkêfê Melîk Xelîl jî bi xwişka Şah Îsmaîl re zewicîbû û wekî zavayê wî ew biyanî nedihat hesibandin (Şeref Xan 1998:129). Xalid Begê kurê Şahsiwar Begê Pazûkî, wê demê kete xizmeta Şah Îsmaîl û Şah, Xinis, Melazê Kurd û bajarokê Uçkanmuşê li derdora Mûşê wek îqta dabû mîrektiya Xalid Beg (Şeref Xan 1998:266). Her wisa mîrê Mehmûdî Mîr Husên û kurê Mîr Hemîd jî bi Sefewiyan re hevalbendî kiribûn (Şeref Xan 1998:239).

Şah Îsmaîl hewl da ku Alauddewleyê Dulqadir bixe bin hikmê xwe lê ew reviya Elbîstanê. Bi vê bûyerê Hakimê Diyarbekirê Emîr Begê Misûlî jî kete xizmeta Şah Îsmaîl. Di vî şerî û şerê piştî wê de hinek ji Kurdan li aliyê Safewî û hinek jî li aliyê berxwedanê de cih digirtin. Lê li dawiyê gelek Kurd mirin û siyaseta serxwebûnî ya Kurd bi awayekî xwezayî ji vê yekê zirar dît. Di encama desteserkirina Diyarbekirê ji aliyê Safewîyan ve Muhammed Bey Ustaclu li vir hat wezîfedarkirin (Ferruhi & Eminpur 2021:129-130). Herweha wî jî hewl da ku gav bi gav mîrên Kurd ên serbixwe yên li derdorê tasfiye bike (Nuri C. & Nuri F. 2021: 85-86). Di sala 1508an de serokê Egilê Lala Qasim li dijî Şah Îsmaîl serî hilda û wî Egil jê stand (Şeref Xan 1998:148-149). Berxwedana mîrê Hetaxê Mîr Ehmed Beg kurê Mîr Muhammed Zirqî jî ji aliyê Safewîyan ve hat şikandin û Safewîyan rêveberiya wê derê da Eşîra Kaçaran (Şeref Xan 1998:195; Gümüş, 2012:455-457).

Mîrê Cizîr Mîr Şeref kurê Mîr Bedir jî leşkerê Sefewî ku sê caran şandibûn serê, têk bir. Şah Îsmaîl newêrîbû careke din êrîşî vir bike (Şeref Xan 1998:105-106). Şah Elî Begê kurê Mîr Bedir bi mirina birayê xwe yê Mîr Şerîf, bû mîr. Mîrên Kurdistanê rewşa heyî nirxand û wan biryar da ku bi Şah Îsmaîl re lihevkirin guncav be. Sala 1505an tevî Melik Xelîlê Eyyubîyê Hakimê Hasankeyfê, Şah Elî Begê Boxtîyê Hakimê Cizîrê, Şah Muhammedê Hakimê Şêrwanê, Gazî Qiran kurê Siltan Ehmed Beg Hakimê Bradostê, Mîr Dawidê Hîzanîyê Hakimê Hîzanê, Şah Elî Begê kurê Mîr Ebu Bekirê Hakimê Sasonê û tevî 12 Hikimdarên Kurd bo muzakereyê li hev kir û çûn Xoyê bal Şah Îsmaîl (Şeref Xan 1998:106, 130, 157, 235, 330 ). Lê berevajî lihevkirinê, wî ev mîrek avêtin zindanan, siyasetek dijminahî bi ser wan de ajot û Diyarbekir, herêma mîrektîyên ku giredayî wê Egil, Mûsil, Sincar/Şingal, Mêrdîn, Erzîncan, Xarpêt, Ercîş dagir kir (Şeref Xan 1998: 106, 130, 235; Genç 2011:72; Aydeniz 2012:150-151).

Şeref Xan (1998:331) dibêje ku sedema girtina begên Kurdistanê ji aliyê Şah Îsmaîl ve li ser tawanbarkirin û îftirayên Muhammed Ustaclu ye. Li gor vê agahiyê, Ustaclu nameyek nivîsandiye Şah û gotiye heger begên Kurd ku bên cem wî, bila wan bigire. Ji bo vê jî ger Şah emir bike, ew ê bi piçekî alikariya Şah êrîşî welatê Kurdistanê bike. Şah vê ramanê guncaw dibîne û di nav wan de bi tenê Hakimê Şêrwanê Şah Muhammed û Hakimê Sasonê Şah Elî Begê berdide û ên din giştan qeyd û zincîr dike. Lê belê di sala 1505’an de ji ber çalakiya bêhişî ya Şah Îsmaîl li dijî mîran, pêşewayên Kurd rûyê xwe ji Safewîyan kişand û wan berê xwe da tifaqîya Osmanîyan. Lê ji xeynî van, Hakimê Erdelanê, Bega Beg ku artêşa wî 12 hezar kes bû, neket bin serweriya her du dewletan. Bêalî ma û wî heta sala 1616an serxwebûna xwe parast (Ardalan 2007:43-44).

Heta vê bûyera zincîrkirina mîran di navbera Safewiyan û Împeratoriya Osmanî de tu hevdîtin çênebû. Yekem hewldana Mîran bo hevalbendiya Şah, bi neyînî dawî bû. Ji ber vê yekê tê fêmkirin ku mîrên Kurd di rûbirûbûna Împeratoriya Osmanî û Safewiyan

de bi bandor bûne. Gava mîrên Kurdistanê firsend dîtin û reviyan, di fikra lihevkirina digel Siltanê Osmanî Selîmê I de tifaq kirin. Siltan Selîm dixwest ku li dijî Safewiyan seferekê bike. Lê mirov dikare bêje ku mîrên Kurdistanê bêtir Siltanê Osmanî motive kirine. Ji ber ku dema vegeriyan mîrgehên wan ji aliyê mîrên Sefewî ve dihat birêvebirin. Pêwîst bû bi hêzeke guncav, ku bi hêzeke mezin re têbikoşe, li dijî wan hevalbend bûya.

Di wê pêvajoyê de Hikimdar û Mîrên Kurdistanê ji neçarîyê berê xwe da Osmanîyan ku erdên xwe ji destê Sefewîyan bistînin. Piştî ku Mîr Şerefê Bedlîsî vegeriya, pê hesiya ku nikare kela Bedlîsê ji destê Sefewiyan bigire. Bi vî awayî, wî biryar da ku bibe hevparê şerê Siltan Selîm li dijî Şah Îsmaîl. Ji bo vê jî bi Îdrîsê Bedlîsî û Şêwirmendê xwe yê Mihemed Axayê Kelhokî re plan çêkirin. Nêzî 20 pêşewayên Kurdistanê, Îdrîsê Bedlîsî û Mihemed Axayê Kelhokî wekî nûner hilbijartin û şandin Stenbolê ji bo sazkirina tifaqa xwe digel Osmaniyan (Şeref Xan 1998:334-335). Dadwerên Kurd ên ku di dema windakirina axa xwe de nikarîbûn bibin yek, piştî windakirinê, wan reflekseke yekbûnê bi pêş xist. Bi vî rengî Kurdistan di nav du hêzên mezin, Osmanî û Safewîyan de bû qada şer.

**Peymana Hikimdaran 1514 û Analîza Wê**

Di şerê Siltan Selîm ê Çildêranê ya li hember Şah Îsmaîl de hakim û begên Kurdistanê jî cih girtin. Dema ku şer bi serkeftina Osmaniyan encam da, Siltan Selîm jî ji Tebrîzê vegeriya Amasyayê. Di vê navberê de Îdrîsê Bedlîsî ji Siltan daxwaz kir ku mîrên Kurd wîlayetên ku ji wan re mîras bûne "eben ‘an cedd"/ji bav bi kur ji wan re bibexşîne. Mîrên Kurd ji berê de niyeta xwe bi vê yekê zelal kiribûn. Selîmê I. jî ev pêşniyaza pêşawayan pejirand ku fermanrewaya wan a mayînde ya ji bav bi kur li ser axa xwe wek “mafê irsî” berdewam bike. Wî jî ji van xwest ku ew kesekî ji nav xwe destnîşan bikin ku ji wan re mîrêmîrantî û mezinatî bike (Bedlîsî 2016:283-288). Siltan ji bo şopandina van xebatan Îdrîs erkdar kir. Serokên Kurdan ji nav xwe yekî namzed nîşan nedan. Di şûna wê de, wan diyar kir ku ewan kesekî ji hêla Siltan ve hatî pêşniyarkirin dê qebûl bikin. Siltan jî Biyiqlî Mehmed Paşa kir mîrêmîran û waliyê Diyarbekirê (Şeref Xan 1998:334-335).

Di vê navberê de, siltan dema li Amasyayê bû, pêşî mîrên Kurdên Bradostê paşî Melîk Emîr Seyîd kurê Şah Elî, Hakimê Îmadiyê Emîr Siltan Huseyn li wir ji Siltan Selîm re biat kirin/ wan ji karû berê wî de soza bihevrebûnê ya wefadariyê dan. Piştre jî Îdrîsê Bedlîsî çû bajarên Hesenkeyf, Sêrt, Bedlîs û Hîzanê û li wir bi 25 xanedan û mîrên Kurdan re li hev kir ku bi tifaqa Siltan Selîm li hember Qizilbaşan şer bike. Mîrên Kurd soz dan û şer kirin ji bo war û welatên xwe ji Qizilbaşan bistînin (Bedlîsî 2016:283-288, 303-339). Bi vî awayî Bedlîsî bi ser ket û wî Diyarbekir û Mêrdîn bi dest xist. Mîrên Kurd desthilatdariya Siltan qebûl kirin. Beramberî vê jî siltan mafên hikimdariya wan nas kir û ew maf û welatê wan ku wekî mîrate ji wan re mabû, teslîmî wan kirin ku di serxwebûna mutlaq de bi kar bînin (aba an ced-ji bav ber bi law) (Bedlîsî 2016:339-356; Şeref Xan, 1998: 334-336- Şemsi, 2010: 78-81).[1]

Peymana yekem 1514an ku di navbera Siltan Selîm û Mîr û Hakimên Kurdistanê de hat kirin, kêm zêde li ser van xalan bû:

I. Dê serxwebûniya Mîrekî ya Kurd bê parastin û ev, ji bav ber bi kur, dê wek mafê mîratê derbas bibin

II. Dema şer Mîrekîya Kurd wê bi hêzên xwe tevlî arteşa Osmanî bibe.

III. Dê baca şer’î bişînin Dewleta Osmanî (Mihemed Emîn Zekî Beg, 2002:124: Ekinci, 2019:54).

Herçî Zekî Beg (2002:124) ku xalên peymanê firehtir dike û xala 5an de dibêje: Osmanîyan ku, -êrîşek li hember Kurdan çêbe wan alîkar bibin- pir mequl naye. Ji ber ku Kurd di vê tifaqê de mutefîqê biçûk bûn, çunkî wan xwe wekî girêdayî Osmaniyan qebûl kiribû. Beramberî vê, siltan jî warên Kurdan wek girêdayî xwe qebûl dikir ku şerek li hember Kurdan derketa, dê ne bi tenê ya Kurdan, herweha dê wekî êrîşa li dijberî Osmanî bihata qebûlkirin.

Ji bilî van jî di rastîyê de heta niha wesiqayek/pelek ku vê peymanê îsbat bike ji arşîva Osmanî derneketiye. Lê tê zanîn ku siltan, bi Îdrîsê Bedlîsî re 17 al şandiye ji bo di nav mîrên Kurd de belav bike (Şeref Xan, 1988:334; Xoce Sadeddîn, 1279.C. 2:326; Ardalan, 2011:44,; Şemsi, 2010:83-84; Yaşın, 2011:80). Ev yek bes e ji bo îsbata peymana ku di navbera Mîrên Kurd û Siltan Selîm de hatiye danîn. Ji hêleke din ve rastiyek jî ev e ku ji alîyê hinek sazîyan ve li gor rewşa polîtîk wesîqayên weha girîng ku statuya Kurdan diyar dike tê veşartin. Her çiqas peymanên weha veşartî, yan eşkereyî li ser kaxiz nehatibin morkirin jî, kronîkên vê serdemê, wekî Xoce Sadeddîn, Îdrîsê Bedlîsî û Şeref Xan ve him ji hêla Osmanîya ve him jî ji hêla Kurdan ve hebûna van têkilnameyan diyar dike.

**Peymana Hikimdaran 1535: Siltan Silêman Digel Hakimê Kurdistan û Analîza Wê**

Siltan Selîm ji bo parastina sînorên di navbera Osmanî û Safewiyan de eşîr û Hakimên Kurdan weke hêzeke tampon/ewle didît. Piştî Siltan Selîm dema Siltan Silêman jî heman erk ji peşêwayên Kurdan xwestibû. Çima Siltan Silêman pêdivî pê dît ku peymaneka nû çêbike tevî ku di serdema Siltan Selîm de tiştek berevajî vê peymana berê nehatibû? Li ser sînorê Osmanî-Îranê hin şert û mercên guherînê hebûn. Lewra vê yekê li Kurdistanê jî hinek bandor kir.

Di serdema Siltan Silêman de pirsgirêkên bi Safewiyan re neqediyabûn. Piştî navbera 19-20 salan a piştî Şerê Çaldiranê ya 1514an, têkoşîna Safewî ya Osmanî dîsa dest pê kir. Siltan Silêman ku di sala 1520an de bi mirina Siltan Selîm hat ser hikim, berê xwe da Rojava û bi seferên Belgrad û Rodosê re mijûl bû. Di rewşa siyasî ya aliyê Îranê de, bi mirina Şah Îsmaîl di sala 1524'an de, Tehmasb I, cihê wî girt. Hin serhildan û bûyerên ku ji ber propagandaya Sefewiyan qewimîn û ew penaberiya hevbeş a hin desthilatdaran, bû sedema şerên bi Îranê re. Yek ji wan Zulfîqar Xan bû ku piştî girtina Bexda pabendî Osmaniyan bûbû. Bi vî awayî Tahmasb ku dixwest Bexdayê paşde vegerîne, ket tevgerê. Wî Bexdaya ku bûbû warê Osmaniyan ji nû ve bi dest xist. Bûyereke din jî Ulama Xana ku ji umeraya Sefewîyan bû xwe spartibû Osmaniyan. Piştî ku Ulema Xan xwe spart Osmaniyan, ji bo ku zemînekê ji xwe re amade bike, dest pê kir, ket binê Şeref Xan heta ku wî ew li ber çavê siltan reş kir. Di encama entrîkayên Ulamê Xanê de, yek ji hakimên girîng ên Kurdistanê, mîrê Bedlîsê Şeref Xan neçar ma ku xwe bispêre Sefewiyan (Şeref Xan, 1988:336-349; Emecen 1999:116-117).

Ev bûyera dawî bû sedema aloziyan li Kurdistanê û heremên sînorê. Ji bo Osmaniyan jî him careke din bidestxistina Bexdayê û bi ser de jî mijara tifaqa Osmaniyan a bi Kurdistanê re dîsa hat rojevê. Ji ber ku rola Bedlîsê li ser Kurdistanê girîng bû, ji bo pirsgirêkên sînorên bi Îranê, diviyabû piştgiriya mîrên Kurd û pabendbûna wan bi şer re bihata kirin. Seferên ku ji bo vê armancê hatine kirin; wekî seferên Iraqa Ecem (Bakurê rojavayê Îranê) û Iraqa Ereb (Bexda û derdora wê) Iraqeyn (du Iraq) têne binavkirin (Şeref Xan, 1988:349-351; Emecen 1999:116-117).

Van bûyeran ji 1533an heta 1534an dom kir. Di heman salê de, her çiqas Siltan Silêman jî ji Tebrîzê ber bi Tahmasbê ya Siltaniyeyê ve çûbe jî, her du artêş li hev nehatin.

Di sala 1535an de artêşa Osmanî dîsa derbasî Azerbaycanê bû. Piştre wan berê xwe da herêma Şehrîzorê û gelek serokên eşîrên Kurd ên li vir desthilatdariya Osmanî qebûl kirin (Şeref Xan, 1988:349-351; Emecen 1999:116-117). Îhtimal heye ku ji bo vê munasebetê, Siltan Silêman peymana ku bavê xwe Siltan Selîm di sala 1514an de bi hakîm û mîrên Kurdistanê re çêkiribû di sala 1535an de dubare kir. Wisa tê fikirîn ku peymana ku em jê re dibêjin "Peymana Hikimdaran" di derdora sala 1535an de pêk hatiye.

Dema ku Siltan Silêman amadekariya sefera Îranê dikir, wek ku di peymanê de behsa wê dike, berê Wezîr Îbrahîm Paşa şandibû. Îbrahîm Paşa ev agahî bo siltan par kiribû: "*Min bi mîren Kurdistanê re mişawere kir û îtifaqên wan stand di şûn de ketin wîlayeta Azerbeycanê. Ji destê Şahê şeytanan bajarê Tebrîz û di dora wî de çiqas keleh hebûn hemî jê standin. Di van şeran de pir hevalbendî û meranîyên mîrên Kurdistanê hatine dîtin*"[2] Weke li jorê hatê dîtin, windakirina piştgiriya Mîrê Bidlîsê û bandora wî ya li ser hakim û mîrên din ên Kurdistanê û herweha şerê ji bo İrane pêdivî bi nûkirina peymanê çêkiriye. Bi vî awayî dê baweriya şikestî ya di navbera mîr û hakimên Kurd û Împeratoriya Osmanî de bihata zexmkirin.

Tê fêmkirin ku Qanûnî ji bo sefera Îranê piştgirî ji wan xwest. Wan jî herweha di peymanê de hatiye gotin: ji siltan xwest ku mafên mîrata welatê wan bide wan. Pêşewayên Kurd li hember Safewî û dijminên Osmanî alîgirî qebûl kirin. Lewra Qanûnî peyman bi Hakim û Mîrên Kurdistanê girê da. Çinku ji ber ku ew pê re hatin şerî, wî jî mafê wan ê li ser erdê wan, wekî "yurtluk-ocaklik"/"welatî-milkane" ji bo wan pejirand (Ünal, 2006:284; Ekinci, 2022:145-155). Tê fêhmkirin ku ev rewş, eger ne muzakereyek tam be jî, bi rengekî muzakere pêk hatiye. Ji bo vî cureyê rewşa siyasî ya ku her du alî tê de bi ser dikevin, "têkiliyeke simbiyotik" tê gotin.

Qanûnî dû van şeran jî ya ku tevlî arteşê wî bûn re fermanek derxist û sozê xwe bi cih anî. Siltan Silêman van îmtiyaza ku ferman dikir wek "mu'ahede" bi nav dikir. Mu'ahede bi xwe diyar e ku, ne peymanek yekalî ye lihevhatinek hevbeş e û herî kêm bi du aliyan pêk te. Lewra di vî peymanê de aliyek nûnerê Dewleta Osmanî Siltan Silêman; aliyê din jî nûnerên gelê Kurd, Hakim û mîrên Kurdistanê bûn. Ev mu'ahede ango peymana ku îmtiyaz û mafên Hakim û Mîrên Kurdistanê careke din diyar kiriye ev bû:

"…Dema min Serleşkerê xwe yê Siltan Îbrahîm Paşayê şand welatê rojhilat, wî bi mîren Kurdistanê re mişawere kir û îtifaqên wan stand, peyre ketin wîlayeta Azerbeycanê. Ji destê Şahê şeytanan bajarê Tebrîz û di dora wî de çiqas keleh hebûn hemî standin. Di van şeran de pir hevalbendî û meranîyên mîrên Kurdistanê hatine dîtin. Serleşkerê min di warê olî de îstîqamet û mitaba'at, dilawerî û sadaqata wan gihîştandiye min. Ji bo bergîdanê, îxlas û xatirên wan welatên wan a ku ji berê ve di destê wan de ku niha di nav milk û eyaletên min de ye ji min xwestin. Min jî ji mîrên Kurdistanê re eyaletên wan, kelehên wan bi beratê nivîs û morkirî, bi şefqeta xwe da wan. **Tevî wan keleh, bajar, gund, mezra û hemî mehsulên wan, min wekî milkê tam da** wan, **kur û kurê wan** û min got: Madem li ser ola Îslamê ne ruyê xwe û ji text û dûgela min venagerînin û giredayîbin, **ji saltanata kurên min û xelîfe, wuzera, mîrêmîran, umera, mutasarrifîn-i emwal û muhassilên mubaşirên a'malê tu kesê li dû min bên jî her çi dibe bila bibe û bi çi sedemî û bi çi rengî ji destê wan neyê standin êrîş li wan neyê kirin.** Ev emrê min ê gewre neyê xerakirin, guherandin û dagerandin û ew kur bi kurê xwe nifş bi nifş li ser milkîyeta xwe, xwedî bin. Li ser vê milknameyê himayûna min ve eyaleta wan kesan, **ger kurekî wî hebe jê re, ku zêde kurê wî hebe, kîjanî dixwazin jê re, ku keleh û cihên xwe di nav xwe de**

**xwastin belav bikin an bi şeklekî din çawa dixwazin bixwazin, mîrên Kurdistanê bi çi şeklî guncan dîtibin wan ên ku milk gihîşte destên wan, heta dawîya dinê xwedîyê milkê xwe bin. Ger tu kes bi destûr û hêza Xwedê ji malbatên wî mîrê nemabe, heta hingê jî ji yekî xerîb re neyê dayîn û mîrên Kurdistanê bigihîjin li bal hev û bişêwirin û bi yekbiryarî kîjan mîr an mîrek layiq bibînin, ew milk/erd jê re bê dayîn. Ez sond dixwim bi yekîtîya Xwedê** û bi rûmeta giştî ya fexrê du cîhanê –silavê Xwedê li ser be- û ji bo mafê rîsaleta wî ku **madem mîrên Kurdistanê li ser vê "mu'ahedeya hûmayûna min/peymanê min" in, ew bi dostê min re dost û bi dijminê min re dijmin dibin, wê demê ev fermana şerîfê min neyê guhartin.** Ji lawên min ên piştî min re emr û wesîyeta min ew e ku kesek ji wan, emrê min xera neke û kî vî emrê min xera bike, ew li bal Xwedê sûcdar û zilimkar e. Lêbelê ew mîrê Kurdistanî jî di kolana dilsozî û îstîqametê de bin û di pêwendîya karê dûgelê de bi mîrêmîrananê Diyarbekr û Bexdayê û mîrên Kurdistanê yekdil û yekrê re bixebitin û ger dijmin hat, bi leşkerên xwe ve bi leşkerên min re alîkar bin. Li gelê ku di bin rêvebirina we de ne zilm nekin û li dijî şer'a şerîf tevnegerin. Ji lawên min kî pêşî ji bo saltanat û xîlafetê gihîşt û rûniştibe, jê re bibin tabî'. Ew lawên min ên ku di dervêyî saltanatê man e jî, wekî dijmin nas bikin û çi hawar bixwazin jî nepejirînin û neçin alîkarî ya wan."[3]

Di Împaratoriya Osmanî de gelek cûreyen aştiyê derketine holê. Di nav wan de cûreyên wekî emanname, sulhname û ahidname hene. Ji bilî peymanên aştiyê, gelek peyman hatine çêkirin. Peymanên aştiyê, carna bi awayê nûkirina aştiyê, carinan jî piştî şer çêdibûn. Herweha peymanên tifaqê jî hebûn (İpşirli 2009:490-492). Ehd û ehdname, di navbera her du dewletan de wek metna peyman û muselete hat bikaranîn. Herweha di wateya biryarên tayînkirinê yên ku xelîfet û mîrên di derbarê mîratgir, amil, walî û qaziyan de hatine çêkirin û nivîsandina ku wan de bi şeklê ferman û talîmatan li ser mijarên cûrbecûr ferman dane dihat bikaranîn (Fayda 1988:535-536). Li ser van malûmatan diyar e ku ev metna peymanê ne emanname ye, ne sulhname ye jî. Çinku Kurd û Osmanîyan li dijî hev şer nekirine da ku aşitiyê bikin.

Di ehîdnameyê de çawa hinek şert û mercên ku di encama lihevkirinê de hatine bidestxistin hene, hinek îmtiyazên wan xwestine jî hene. Ew ne belgeyeke ku ji aliyê du terefan ve hatiye îmzekirin. Lê dema ku peymana aştiyê hebûya, her alîyan, dê ji hev cuda îmze kiribûya. Di destpêka peymanên aştiyê de îmzeya siltan hebû. Heta sedsala 19an ji peymanên aştiyê, yan jî ji tawîzên bazirganî re ahidname dihat gotin. Lêbelê, bi demê re, wê îmtiyaza xwe ya yekalî winda kir û wan nasnameya muahedeyeke/peymaneke hevbeş bi dest xistiye. Tê dîtin ku peyva ahidname di dawiya pêşgotinê de weku muahede hatiye guhertin. Ev yek nîşan dide ku êdî desthilatdarên Ewropî bi siltanê Osmaniyan re li ser asteke wekhev hatine qebûlkirin. Ji bilî vê, dîbaceya peymanan, ji yên ehîdnâmeyê hinekî kurttir in. Ehîdname ji bo qral û mîrên di bin desthilatdariya Osmaniyan de dihat dayîn (Kütükoğlu 1988:536-540). Di mu'ahede/peymana Qanûniyê de du alî hatine diyarkirin ku aliyek, Hâkim û Mîrên Kurd in lê her du alî jî bin metnê îmza /mor nekirine. Ji diyarkirina alî diyar dibe ku statuyek dide serekên Kurdan. Ev statu, ji ber ku wan bi hev şer nekiriye, ne teslîmiyet e û ne jî girêdanek pir teng û hişk e. Ev belge diyar dike ku peymaneka tifaqê ye. Ev îtîfaq nîşan dide ku ew xwedî statuyeke rêzdar in û ew ji qralên Ewropî ne kêmtir in.

Taybetmendiyên belgeya ehidname, yan jî muahedeyê, ji van şertan pêk tê: Di hin ehîdnameyan de piştî besmeleyê, nav û nasnavên xelîfe û warisê wî, li dû jî metna

hemdele (pesn) û wesiyetê tê xwendin. Hin ji wan hemdele li pey besmele, nav û li nik xelîfe û warisê wî û nivîsa wesiyetê, di dawiya ehîdnamiyan de ne û di destnivîsa xelîfeyan de hevokek kurt heye, ku tê de şahid û mîratgiran xelîfetî qebûl kirine (Fayda 1988:535-536). Di mu'ahedeya Qanûnî de çend rêzên serî ya di destpêkê de, tevî nasnavê xelîfe, beşa ayet û duayê heye. Li vir muahede û ahidname dişibin hev û peymana Qanûnî jî li gor van şertan hatiye çêkirin.

Di warê dîplomatîk de ehidnâme, wekî di ferman û beratên siltan de, bi navê Xwedê, pêxember û her çar xelîfeyan tê gotin û alîkariya Xwedê bi vexwendina ji bo şefaeta Pêxember dest pê dike. Li binê wê jî mora /tuxraya siltan cih digre. Di hin ehidnâmeyan de beşa "unwan" tê gotin ku wesfên siltan têne jimartin ku ew aliyek e. Piştî unwan, bi kurtî sifatên (elqab) hember (aliyên din) derbas dibe ku dia jê re tê xwendin. Li dû jî di destpêkê (dîbâceyê) de sedem û şertên dayîna ehidnamê têne vegotin (Kütükoğlu 1988:536-540) Vî şertî di peymanê de cih girtibû û weku hâkim û mîrên Kurd di peymanê de ji siltan kîjan şertî jê xwestine ku ew jî bi dayîna mafên mîrata welatê wan bû. Herweha di peymana Qanûnî de tuxra nehatiye danîn, lê hemû sernav, elqab û nîşaneyên siltan hatine rêzkirin.

Çi cure ahidnameyê be jî, di dawiya dîbâceyê de soz tê dayîn ku ew ê li gorî şertên ahidnameyê tevbigere. Di sedsala 15an û 16an de ev mijar bi taybet di ehîdnameyan de bi xurtî hatiye vegotin. Di pey vî re jî sondên her du alîyan heye ku muahedeyan/peymanan, li ser rêya sadaqat û dilsozîyê pêk bianîyana. Elbet ne pêkan bû ku nusxeyên mutleq û hukmên ehidnâmeyê bi sondên siltan werin sepandin (Kütükoğlu 1988:536-540). Di nusxeya peymana 1535an de Qanunî jî ev sond dixwend:

"Bu Mu'ahede-i Humayunumun te'kidi ve emr-i celîli'l-muqadderemin taqarrür ve temhidi içün yemin dahi iderim ki Subhanehu Te'ala'nın wahdaniyyeti ve iki cihan faxrinin salawatu'l-lahi aleyhi we's-selama hurmet-i nübüwwet ve risaleti hakki içün madam ki mezbur caddeme (tarik-i siltani) sadakat üzere dostuma dost düşmanıma düşman olub ixlasla atebe-i ulyama mutî' ve münqad ola ferman-ı şerifim bir dürlü dahi olmayub tebdil ve tağyir olunmaya. Benden sonra dahi ewlad-ı saadet medarıma emrim ve wasiyyetim ol wecih üzeredir ki bu husus da wâqi' olan emirlerimi bozmayub onlar dahi ala ma-kân ri'ayet eyleyeler her kim ki bu emrime muxalefet ve mu'anedet ile ne'uzü bi'l-lah-i teala yewmi bi qawmi'l-hisab inde'l-mülküllahım …. olub garaz-ı zaliminden ola!"

"**Ez sond dixwim bi yekîtîya Xwedê** û bi rûmeta giştî ya fexrê du cîhanê –silava Xwedê li ser be- û ji bo mafê rîsaleta wî ku **madem mîrên Kurdistanê li ser vê "mu'ahedeya hûmayûna min/peymanê min" in û ew bi dostê min re dost û bi dijminê min re dijmin in, wê demê ev fermana şerîfê min neyê guhartin.** Ji lawên min ên pişt min re emr û wesîyeta min ew e ku kesek ji wan emrê min xera neke û kî vê emrê min xera bike ew li bal Xwedê sûcdar û zilimkar e!"

Lê piştî wan aloziyên sinorên Îranê derbas bû di şûn de rojên pêdivî bo Kurd jî derbas bûn û hêdî hêdî sonda lawên siltan bav (Qanûnî) di sedsalan din de hat betalkirin (Azîz Efendî 1209: Beyter & Ekinci 2012:20-27; Ekinci 2012:12-19).

Her çiqas ji wan re ahidnâme dihat gotin, çi peymanên aşitiyê bin, çi jî peymanên bazirganîyê bin, heta sedsala 19an îmtiyaza xwe ya yekalî winda kirin û nasnameya peymana hevpar bi dest xistin. Dîsa wek berê tê dîtin ku peyva ehidnâme ya ku ber bi dawiya dîbâceyê ve hatîye behskirin, her çiqas di destpêkê de îmzaya siltan tê de hebe jî bûye muahede. Ev yek nîşan dide ku êdî desthilatdarên Ewropî bi siltanê Osmaniyan re li

ser asteke wekhev dihat qebûlkirin. Ji bilî vê, dîbaceyên peymanan ji yên ehidnâme hinekî kurttir in (Kütükoğlu 1988:536-540).

Gelek lêkolîneran ev peymanî, wekî *temessuk* an jî *temlikname* bi nav kirine. Lê di rastîyê de ew ne temesuk ne jî temlikname ye. Berî her tiştî, ew ji xwe mu'ahede/peymanek e, ji ber ku Qanûnî Siltan Silêman bi destê xwe, ew belge di nav nivîsê de bi navê mu'ahedeyê bi nav kiriye.

Her wisa *temlikname* hikimdar hinek beşên erd û avahiyên ku ji erdê mîrî an jî kesan ji dewletê re hatine veguheztin (întîqal) ji kesên ku xizmeta dewletê kirine re vediqetîne. Ji belgeya ku bi vê yekê ve girêdayî ye bi navê *temlik-name* (mulk-name) tê gotin (İpşirli 2009:413-414). *Temessuk* jî; di zimanê dîplomatîk de, ew belge ye ku di rewşên wekî deynkirin, dayîna deyn, teslîmkirin an wergirtina tiştekê de ji alîyê din re tê dayîn (Kütükoğlu 2011:413-414). Jixwe dema ku peyman were lêkolînkirin, bi zelalî tê fêmkirin ku ew ne temesuk û ne jî temlîk e.

Bê guman, wekî ku hemû taybetmendiyên wê li jorê hatin ravekirin, ev peymanek e. Şertê peymanê ew bû ku hakim û mîrên Kurd, wê rojê di şerên li dijî Îranê de û piştre di hemû şeran de beşdarî tifaqa Osmanî bibin. Hakim û mîrên Kurd bi şertê ku mafên wan ên îrsî li ser war û welatên xwe bên qebûlkirin, wan ev peyman pejirand. Ev jî di belgeyê de bi zelalî hatiye gotin. Ji ber vê yekê, xelet e ku meriv rêza peymanê ya belgeyê ji rêje û dereceya temliknameyê kêm bike. Ev peyman bi yek kesî re nehatiye çêkirin. Muxatabên wê peymanê li ser navê Împaratoriya Osmanî Qanûnî Siltan Silêman e û li ser navê Kurdan jî hemû axa û serwerê Kurdistanê ne.

Di peymana ku di dema Selîmê I-em de hat qebûlkirin de hem rewşa mîr û hakimên wî û hem jî hûrgiliyên vê statûyê hatibûn diyarkirin. Çawa ku tê zanîn li cem Împaratoriya Osmanî di qanûnên “yurdluk-ocaklık û rêveberiya “sancaqên hikûmetê” de ev bi berfirehî hatibûn diyarkirin. Bi rastî ev peyman, jixwe ji dubarekirin, nûkirin û zexmkirina peymana serdema Siltan Selîmê I-em pêk tê. Ji ber van sedeman jî di peymana Qanunî de, erkên aborî yên rêveberiya kurd û hûrgiliyên, agahiyên wekî li ser navê kê divê xutbe bê xwendin nehatin gotin.

**Rewşa Hakim û Mîrên Kurdistanê Li Dû Peymanê**

Aliyê Safewîyan jî û alîyê Osmanîyan jî şerên xwe wekî “cihad” bi nav dikirin û wan Kurdistan ji bo berjewendiyên xwe dikirin qada şer (Şemsi, 2010:94). Li ser vê, Kurdan ji neçariyê di rewşa man û nemana jiyanê de, dem bi dem hêza xwe winda kirin. Ji bilî vê, mîrê ku dixwest hikimeta xwe ya otonom biparasta, siyasetê dikir, weku Xalid Begê Pazukî ku demekê bi şûn de tifaqa xwe ligel Şah Îsmaîl xera kir. Li ser navê xwe xutbe da xwendin û perê xwe çap kir. Demekê bi şûn de jî digel Osmanîyan ket nav tifaqê. Lêbelê li wir jî nedomand. Ji ber vê jî Siltan Selîm, di vegera şerê Çildêranê de ew kuşt (Şeref Xan 1998:266).

Her du hêzan jî eşîrên kurdan, ji bo armancên xwe bi kar dianîn. Ji ber ku yekbûneka wan a sîyasî tune bû, ji bo ku li ser hikmê xwe bimînin, di şerê her du aliyan de ew dibûn alav û piyon. Bo nimûne, di serdema Qanûnî de di sala 1551an de, wan berê eşîra Mehmûdî da eşîra Dunbulî ya herêma Xoyê û serokeşîr Hecî Begê Dunbulî hat kuştin. Vêca berevajî bersiva vî bûyerê, Şah Tehmasba I-ê Me’sum begê Safewî û Şemseddin Xanê Bedlîsî dişand bo talana Kurdistanê. Him Sefewî û him jî Osmaniyan li hemberî Kurdan siyaseteke bêperwa meşand. Her du dewletan jî herêma Kurdistanê kiribû qada şer û wekî herêmeke tampon û di navbera wan de Kurd wekî “tampon/seddê sedîd” hatin

tayînkirin. Osmaniyan mîrên Kurd ên di xizmeta xwe de wekî “şah” bi nav dikirin. Berevajî vê Sefewiyan jî sifetê “sultan” li wan dikirin. Bi vî şiklî tinaza xwe bi serwerê Kurdistanê derbas dikirin ku di kodên ramanên xwe de wan kêm dikirin. Qesda wan ew bû ku Kurd, ne dikarin bibin şah, ne jî siltan (Şemsi, 2010:95-97).

Piştî hikmê pêşewayên Kurd qels bû, gava wan serê xwe hildida, wan ew ji alîyê aborî ve di bin bacên giran de ew hatin fetisandin. Ji ber vê jî erd û milkê wan dihatin sitandin û hinek ji wan û dihatin îdamkirin. Tehmasbê I-ê her sal 10 hezar hêstir wekî bac ji mîrê Loristana Mezin re dibir. Herweha Şah, bacên giran li Mîr Mihemedê Loristana Biçûk birîbû. Mîr Mihemedî bacê nekaribû bida û digel esîlên 100 Lorî, li Keleya Elamûtê hat hebskirin. Lewre ev rûdan dibûn sedema serhildanan (Şemsi, 2010:108, 115).

Rêveberiya mîran gelek caran ji aliyê beglerbegên Osmanî ve hatiye desteserkirin û bi çavnebariyê dest didan ser milkên van mîrekan. Tê zanîn ku Şeref Xanê xwediyê *Şerefname*yê jî bû qurbana çavnebariya beglerbegê Wanê. Ehmed Paşayê waliyê Wanê di sala 1601 an jî 1602an de erîş kir ser Şeref Xanê mîrê Bedlîsê. Şeref Xan û ordiya wî di meydanê şer de şikîya û milk û xezîneya wî bi tevî kurê wî yê bi navê Tatar ku hê zarokekî piçuk bû, ket destê Ehmed Paşayê waliyê Wanê (Gümüş, 2022:72)

Herçî Mîrekiya Erdelanê bû, demeke dirêj di navbera du hêzan de serê xwe netewand. Di serdema Selîmê I-an de ne peymana hikimdaran 1514an mor kir, ne jî gava Qanûnî hatibû Tebrîzê çû bal 1534an (Ardalan, 2011:44; Safrastian, 2007:46). Vî mîrekîyê heta karîbû, ji dagirkeriya her du aliyan xwe parast. Lê ji bo parastina hikmê xwe ji neçarî car dibû nêzî Sefewîyan car jî Osmaniyan. Mîrekiya Şarezorê ango Erdelanê heta 1639an ku peymana Zohab ango Qesra Şîrîn ku di navbera Osmanî û Farisan de hat morkirin hikmê xwe domand (Ardalan, 2011:44, 50, 51).

**Encam:**

Di sedsala 16an de mîr û hakimên Kurd li Kurdistanê parçeparçeyî bûn. Hin ji wan dijberî hev bûne û bi giştî tifaqa xwe saz nekirine. Di serî de ji bo rêya tifaqê navxweyî amadehiya xwe nekirine. Ligel vê jî pirê şîrovekaran di vê derbareyî de bi awayê îdeolojîk tevdigerin û ew awayê ku di mijara vabestbûna Osmaniyan de Îdrîsê Bedlîsî tawanbar dikin ne rast e. Herçî bi tevahîya pêşewa nehatibin ligel hev jî pêşewayên Kurd ji ber nêzîkbûna ji alozîya ku dest pê bike di navbera du hêzên mezin a digel Osmanî û Safewî de, li çareserîya serê xwe geriyane. Ji ber ku mîr û Hikimdarên Kurdan hev nedigirt, Şah Îsmaîl ew axa parçeparçeyî ya Kurdistanê girt bin desthilatdarîya xwe. Di vê pêvajoyê de hin mîran serxwebûna xwe winda kir û erdê wan ket bin destê Şah Îsmaîl. 12 hakim û mîrên Kurd, ku hayata wan di xetereke nêzîk de bû, biryar dan ku biçin ba Şah Îsmaîl û li Tebrîzê, li çareseriyekê bigerin da ku pê re li hev bikin. Bi tevlibuna serdestiya Şah Îsmaîl, hêvî dikirin ku berdewamiya serweriya xwe li ser axa xwe misoger bikin. Di nav wan 12 hakim û mîrên Kurd de; Melik Xelîlê Eyyubîyê Hakimê Heskîfê, Şah Elî Begê Boxtîyê Hakimê Cizîrê, Şah Muhammedê Hakimê Şêrwanê, Gazî Qiran kurê Siltan Ehmed Beg Hakimê Bradostê, Mîr Dawidê Hîzanîyê Hakimê Hîzanê, Şah Elî Begê kurê Mîr Ebu Bekirê Hakimê Sasonê hebû. Şah Îsmaîl, berevajî lihevkirinê, hin mîrek avêtin girtîgehê, dijminahî bi wan kir û Diyarbekir, herêma mîrektîyên ku giredayî wê Egil, Mûsil, Sincar/Şengal, Mêrdîn, Erzîncan, Xarpêt, Ercîş dagir kir.

Di lêgerîna mutefiqiyê de îbreyê, bi neçarî, Osmanî nîşan da. Bi wî şiklî di wê pêvajoyê de êdî Kurdistan di serdema berzebûna du hêzên mezin de di navbera Dewleta Osmanî û Safewîyan re rûberû ma û bû qada şer. Hikimdar û Mîrên Kurdistanê neçar man

berê xwe dan Osmanîyan ku erdê xwe ji destê Sefewîyan bifilitînin. Nêzî sî pêşewayên Kurdistanê Îdrîsê Bedlîsî û Mihemed Axayê Kelhokî, wekî nûner şandin Stenbolê bo sazkirina îttifaqa xwe digel Osmaniyan. Selîmê I. ev pêşniyaz bi erênî pêşwazî kir û heta pejirand ku fermanrewaya wan a mayînde ya ji bav û bi kur, li ser axa xwe wek "mafê irsî" berdewam bikin. Îca ev peymana ku bi Siltan Selîm re hat danîn, ji hêla lêkolîneran ve, wekî Peymana Hikimdaran a sala 1514an tê nasîn. Ev tifaq ne tenê ji bo Kurdan, ji bo Osmaniyan jî pêdiviyek bû. Di îtîfaqa hakim û mîrên Kurd de, Osmaniyan di şerê bi Îranê re piştgirî girtin. Kurd jî di warên xwe de mafên xwe yên rêveberiyên hikimetê xwe yên azad parastin. Ev têkiliyeke simbiyotik bû ku her du alî jî pê serkeftî bûn. Osmaniyan li hemberî pirsgirêkên li ser sînorê Îranê, Kurd wekî seddê sedîd/tampon bi kar anîn. Lê rewşa aram a li ser sînorê Osmanî û Îranê piştî demekê xerabtir bû. Hin serhildan û bûyerên ku ji ber propagandaya Sefewiyan qewimîn û penaberiya hevbeş a hin desthilatdaran jî bû sedema şerên dijberî Îranê. Ulama Xana ku ji umeraya Sefewîyan bû, xwe spart Osmaniyan. Bi entrîkayên Ulamê Xanê, yek ji hakimên girîng ên Kurdistanê, mîrê Bedlîsê Şeref Xan neçar ma ku xwe bispêre Sefewiyan. Ev bûyera dawî bû sedema aloziyan li Kurdistanê û heremên sînorê. Ji bo Osmaniyan jî, him careke din bidestxistina Bexdayê û bi ser de jî mijara tifaqa Osmaniyan a bi Kurdistanê re dîsa hat rojevê. Ji ber ku rola Şeref Xan li ser Kurdistanê girîng bû. Qanûnî di sefera Iraqeyn de pêdivî bi mîr û hakimên Kurdistane dît. Qanûnî ji bo sefera Îranê piştgirî ji wan xwest. Wan jî ji siltan xwest ku mafên mîrata welatê wan bide wan. Ji ber vê yekê Qanûnî peymana bo Hakim û Mîrên Kurdistanê girê da ku madem ew pê re hatin şerî, ew jî mafê wan li ser erdê wan wekî "hikimet, yurtluk-ocaqlik"/"welatî-milkane" ji bo wan pejirand. Siltan Silêman van îmtiyaza ku daye wek "mu'ahedeya min"/"peymana min" bi nav kir. Heya ku mîrên Kurd peymanê neşikênin, zarokên ku li pey wî û siltanên ku dê vê peymanê bişkînin, bi tundî dibêje ku ew ê zalim bin û ew razî nebe. Li ser vê Siltan Silêman "Peymana Hikimdaran" ku bavê xwe Siltan Selîm di sala 1514an de bi mîr û hakimên Kurdistanê re çêkiribû di sala 1535an de dubare kir. Ev peymana ku ji aliyê Kanûnî ve hatiye çêkirin, belgeya herî girîng e ku îsbata hebûna peymana bavê wî Selîm e ku heta niha weke belge nehatiye dîtin.

**Çavkanî:**

**Arşiv**

BOA. (Devlet Arşivleri Başkanlığı Osmanlı Arşivi/Arşîvên Osmanî)

TS.MA.E (Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi Evrakı) 1012-0033-001-001/qeyda kevn: E 11969.

**Berhem**

Akdağ, M. 1995. Türkiye'nin İktisadî ve İçtimaî Tarihi. C.I, İstanbul: Cem

Ardalan, S. 2011. Erdalan Kürtleri. Çeviren: Heval Bucak. İstanbul:Avesta

Aydeniz, V. 2012. Akkoyunlu-Kürt İlişkileri. İstanbul:Avesta

Aziz Efendî, "Kanunname-i Siltanî Li Aziz Efendî", Berlin Staatbibliothek, Preussicher Kulturbesitz, Orientabteilung, Nr. 227, Ms. or. quart 1209, Teil 11.

Başçı, V. 2019. "Dunbulî Beyliği Tarihi ve Tarihi Kronikleri VIII-XVIII. yy.)", *Kadim Akademi*, C. 3, S. 2, r. 63-114.

Campanille, R. P. G. 2009. Kürdistan Tarihi. Çeviren: Heval Bucak. İstanbul:Avesta.

Ebubekr-i Tihranî, 2001. Kitab-ı Diyarbekriyye, Çeviren: Mürsel Öztürk, T.C. Kültür Bakanlığı

Ekinci 2012. "Aziz Efendi'nin Islahatnamesi Üzerine", *Kürt Tarihi*, Sayı: 2, Ağustos-Eylül 2012, r.12-19

Beyter Ö.& Ekinci, M. R. “Kürd Emirlerinin Muktedir Oldukları Zamanlarda Yaptıkları Hizmetler”, Kürt Tarihi, Sayı: 2, Ağustos-Eylül 2012, r.20-27.
Ekinci, M. R. 2019. “Mîrektîyên Kurdan di Navbera Têkoşînên Osmanî û Sefewîyan de di Sedsala XV Û XVIIan de” Nûbihar, Issue 11, 2019 r. 47-68.
Ekinci, M. R. 2022. “Beylikten Sancağa Osmanlı İdari Teşkilatında Atak”, *Osmanlı Devleti’nde Yönetim Pratikleri, Yurtluk-Ocaklık ve Hükümet Sancak*lar, Hazırlayan: Erdal Çiftçi E. & Gürhan V. & Ekinci M. R. Tarih Vakfı Yurt Yayinları, r.143-186.
Emecen, F. 1999. “Irakeyn Seferi”, TDV İslâm Ansiklopedisi, r.116-117.
Fayda M. “Ahidnâme” TDV İslâm Ansiklopedisi 1988, C. 1, r.535-536.
Ferruhi, Y. & Eminpur, A. 2021. ‘Şah Îsmaîl, Kürd Ümerası ve Diyarbekir’in İran’dan Ayrılması’ (Wergêr: Ercan Gümüş), *Kurdiname*, 5, r.124-144
Genç, V. 2011. İranlı Tarihçilerin Kaleminden Çildêran 1514, İstanbul:Bengi.
Xoce Sadeddîn, 1279. Tacu’t-Tewarîh, Cild: 2, İstanbul: Tab’hane-i Amîre.
Gümüş, E. 2021, “Mihrani Ekrad Sancağı: Kadim Bir Aşiret Yurtluk Ocaklığı”, Artuklu İnsan ve Toplum Bilim Dergisi, 2021/6 (1), r.1-27.
Gümüş, E. 2012, “Lice ve Çevresinde Kurulmuş Beylikler ve Burada Meskun Aşiretler”, Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri, (ed: Ahmet Erkol-Abdurrahman Adak), Mardin, r. 451-461.
Gümüş, E. 2022, “Zalim Dahhak ve Demirci Kava Efsanesi’nden Hareketle Mitoloji ve Tarih İlişkisine Dair Bir Değerlendirme”, Nubihar Akademi, No. 18, p.47-80.
Îdrîs-i Bidlisî, 2016. Selîm Şah-nâme, Wergêr: Hicabi Kırlangıç, Ankara:Hece
İpşirli, M. 2009. “Temliknâme” TDV İslâm Ansiklopedisi 2001, C. 40, r.430-431.
İpşirli, M. 2009. “Sulh” TDV İslâm Ansiklopedisi 2009, C. 37, r.490-492.
Jwaideh, W. 2009. Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi. Çeviren: Îsmaîl Çeken-Alper Duman. İstanbul:İletişim
Kütükoğlu, M. S. “Ahidnâme”. TDV İslâm Ansiklopedisi 1988. C. 1, r.536-540.
Kütükoğlu, M. S. “Ahidnâme”. TDV İslâm Ansiklopedisi 1988. C. 1, r.536-540.
Mihemed Emîn Zekî Beg, 2002. Dîroka Kurd û Kurdistanê. Wergêr: Ziya Avci. Stenbol:Avesta
Nuri, C. & Nuri, F. 2021. “Şah I. Îsmaîl’in Kürt Emir ve Liderlerinin İsyanına Yaklaşımına Dair Bir Değerlendirme (H. 907-930)” (Wergêr: Ercan Gümüş) *Mehmet Ali Yaşar’a Armağan Kitabı,* Ed. Bozan O&Erpolat M. S. & Sarı S., Hiper Yayın, r.85-95.
Safrastian, A. 2007. Kurd û Kurdistan. Werger: Ergîn Opengîn. Stenbol:Avesta
Şemsi, M. İ. 2010. Şerefname ve Şerefxanê Bedlisi. Çeviren: Hejarê Şamil. İstanbul:Avesta
Şeref Xan, 1998. Şerefname. Çeviren: M. Emin Bozarslan. İstanbul:Deng
Şeref Xanê Bedlîsî, 2012. Şerefname. Werger: Ziya Avci. İstanbul: Avesta
Ünal, M. A. 2006. “XVI. Yüzyılda Güneydoğu Anadolu’da Timar Tevcihleri”Özcoşar, İ.; Güneş H. H. (Ed.), *I.st International Symposium of Mardin History Papers* (pp.281-298). İstanbul: İmak Ofset Basım Yayın
Woods, J. E. 1993. Akkoyunlular, İstanbul:Milliyet
Yaşın, A. 2011. Tarih Kültür ve Cizre. İstanbul: Kent Işıkları.

**Perawez:**

---

* Ev gotar, di rojên atmosfer û xemgîniyekî mezin ya erdhêja mezin ku li Amed, Riha, Semsûr, Meletî, Kilîs, Mereş, Dîlok, Edene, Skenderûn û Xetayê de çebû hat amadekirin. Ez serê xwe li ber giyana wan ditewînim û bi rêz bi bîr tînim.

* Îskenderê Mezin li dijberî Darius li Hewlêrê şer kir û wî Dariusî têk bir. Piştî vî şerî ev bajar bi nav û deng bû. Di wê demê de navê vî bajarî Arbelles bû û niha jî bi Erbîlê tê nasîn. Binêrin (Campanile, 2009:51-52.)

* Tiyul, pergalek e ku dişibihe pergala tîmarê û di berdêla xizmeta ji bo Împaratoriya Osmanî de wekî dahat ji karmendan re dihat dayîn. bnr. (Ekinci, 2012:27).


1 Ardalan (2011:44), ev peyman wek “Peymana Hokmdaran” bi nav kiriye, di cih de ye.

2 Ev peymanname li çend cîya wek nimûne hatibû nirxandin. Binêrin: (Ekinci, 2019:55-56). Gümüş, 2021; 10-11). Lê di vê vêkoline de carekî din bi nêrîneka kûr hat nirxandin. Wê deme di derheqê peymannameyê de “bi du pelan pêk te” hatibû aşkerakirin. Lê piştî lêkolînên dirêj orîjînala vê pelikê hat bidest xistin. Me ev pelik bi temamî dît ku ew ji yek pelî pêk tê û cihên girîng wergerand. Binerin: Pêvek: (Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi Evrakı) kevn: E 11969/ nû: Pêvek: TS.MA.E (Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi Evrakı) numre ya kevn: E 11969/ a nû: TS.MA.E-1012-0033-001-001.

3 Peymana Hikimdaran 1535, (TS. MA. E-1012-0033-001-001).

**Pêvek:**

Peymana Hikimdaran 1535, Topkapı Sarayı Müzesi Arşivi Evrakı (TS. MA. E)-1012-0033-001-001



TSMA.E 1012/33

TSMA.E.1012

**Treaty of Sovereigns 1535 Treaty between Sultan Suleiman the Magnificent and Kurdish Rulers**

**Abstract**:

In the 16th century, the Silk Road that passed through Kurdistan changed, now the emphasis was on the way of transporting commercial goods on the sea route. On top of this, Kurdistan has lost its previous economic status and strength. At that time, the administration of the Kurds was not unified and therefore the Kurds faced a bad economic situation. Because the princes and rulers of the Kurds did not agree, Shah Ismail took the divided land of Kurdistan under his authority. In this process, some princes lost their independence and their lands fell into Shah Ismail's hands. Therefore, together with the Hakim of Heskif, Malik Khalil, the son of Malik Suleiman Ayyubi, the Hakim of Cizre, Shah Ali Beg, the son of Mir Badir Bakhti, the Hakim of Sherwan, Shah Muhammad, the Hakim of Bradost, Gazi Qiran, the son of Sultan Ahmed Beg, the Hakim of Hizan, Mir Davide Hizani, Shah Ali Beg, the son of Mir Abu Bakr. , 12 Kurdish rulers agreed to negotiate and went to Khoy and Tabriz to Shah Ismail. But contrary to the agreement, he threw a prince into prison, made enmity with them, and occupied Diyarbakir, the region of the princely states which included Egil, Mosil, Sinjar/Shengal, Merdin, Erzincan, Kharpêt, Ercish. In that process, Kurdistan faced the period of conflict between the two great powers between the Ottoman State and the Safavids and became a battlefield. The rulers and princes of Kurdistan were forced to turn to the Ottomans to wrest their land from the Safavids. About thirty leaders of Kurdistan were sent as representatives of Idris Bedlisi and Mihemed Aghaye Kelhoki to Istanbul to establish their union with the Ottomans. Selim I. welcomed this proposal and even agreed to continue their permanent inheritance from father to son on their land as a "hereditary right". After this agreement, the Ottomans used the Kurds as a "buffer" for hundreds of years against the problems on the Iranian border. But the peaceful situation on the Ottoman-Iranian border got worse after a while. Qanuni saw the need for Kurdistan princes and judges during the Iraqi campaign. Kanuni asked for their support for the trip to Iran. They also asked the sultan to give them the inheritance rights of their country. On this, Sultan Selim repeated the "Peymana Hikimdaran" that his father Sultan Selim made in 1514 with the princes and judges of Kurdistan in 1535. Legal Sultan Suleyman confirmed this hereditary right with a contract with the rulers of Kurdistan. This work explains about this contract/agreement and its contents. In addition, this work examines the implementation and non-implementation of this agreement according to contemporary sources.

**Keywords**: *The Rulers' Agreement, Humayun's Agreement, Kurdistan, Kurdish Principalities, Hereditary Rights.*